



# ŞERÊ GAMÊŞVANÊ DI WESÎQEYÊN DÎROKÎ Û KILAMÊN DENGBÊJAN DA

Önder BEYTER

The Battle of Gameshvan in the Historical Documents  
and the Songs of the Dengbêjs

Tarihi Vesika ve Dengbêj Kılamlarında Gameşvan Çatışması

## Önder BEYTER

ORCID: 0009-0002-4859-3004 | beyter1990@hotmail.com  
PhD Student, Institute of Living Languages, Department of Kurdish  
Language and Literature, Bingöl University, Türkiye.

## Citation/Jêgir/Atf:

Beyter, Ö. (2024). Şerê Gamêşvanê di wesîqeyên dirokî û kila-  
mên dengbêjan da. Kurdiyât (10), 67-87. DOI: 10.55118/kurdi-  
yat.1555616

## Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 24.09.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 17.11.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2024

## Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/ Çift Taraflı  
Kör Hakemlik-İki hakem

## Plagiarism Checks/Kontrola İntihalê/Benzerlik Kontrolü:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./  
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./ Bu  
makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

## Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been fol-  
lowed while carrying out and writing this study and that all the sour-  
ces used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanîn  
û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etik hatine şopandin  
û hemû çavkanî bi awayekî têtûz hatine referanskirin./ Bu çalış-  
ma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan  
tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

## Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyar/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in  
the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya  
berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında  
herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

## Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddî Destek:

The author acknowledge that they received no external funding in  
support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê  
vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazar, bu araştırmayı des-  
tekleme için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

## Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisans- lama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work  
licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lisansa CC BY-NC  
4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan  
yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif  
haklarını saklı tutarlar.

### Kurte

Şerê Gamêşvanê yek ji wan bûyerên dîroka Kurdî ye ku di destpêka sedsala 20em da qewimiye û bûye sedema kuştina gelek însanan. Ji ber ku di encama vî şerî da gelek insan hatine kuştin, karbidestên dewletê yên wê hingê bi awayekî cidî li ser meseleyê rawestiyane û xwestine bêtir tedbîr bîn wergerin da ku rêtina xwinê dewam neke. Herweha vê bûyerê rengê xwe daye kilamên dengbêjan jî. Îja di vê gotarê da bi metoda wesfî û berawirdî hewl hatiye dayîn ku li ber roniya wesîqeyên arşîva Osmanî û herweha kilamên dengbêjan ew yek were fêmkirin ka ev şerê ku di sala 1907an da li gundê Gamêşvanê qewimiye, ji ber çî sedemê derketiye û di vê babetê da wesîqeyên dîrokî û kilamên dengbêjan ji hevdu digirin yan na. Di vê çarçoveyê da ev wesîqe û kilam hatine berawirdkirin û analîzkirin. Di encama vê lêkolînê da hatiye tesbîtkirin ku yekane fikar û tatêla peywirdarên dewletê yên di belgeyan da diaxivin, bi tenê pergala qamûyê û îstiqrar e, qet serê xwe pê neêşandine yan jî ji bo wan giring nebûye ka çend kes û ji bo çî hatine kuştin. Lê di kilaman da salixê meydana şerî hatiye dayîn û leheng tevî wesfên xwe hatine nasandin.

**Peyvên Sereke:** Dengbêj, Kilam, Arşîva Osmanî, Şerê Gamêşvanê, Eşîra Heyderan.

### Abstract

The Battle of Gameshvan is one of the events in Kurdish history that occurred at the beginning of the 20th century and caused the death of many people. Since many people lost their lives in this conflict, the state authorities of the time looked into the issue seriously and demanded that more precautions be taken to prevent further bloodshed. Also, this event has given its color to the songs of the dengbêjs. In this article, with the descriptive and comparative method, an attempt has been made to understand the reasons for the conflict that took place in the village of Gameshvan in 1907 in the light of the documents of the Ottoman archives and the songs of the dengbêjs and whether the historical documents and the words of the dengbêjs are different from each other or not. In this context, these documents and songs have been compared and analyzed. The research has shown that the only concern of the government officials speaking in the documents is the security system and stability, and questions such as the cause of the conflict and how many people were killed as a result of the conflict are not important to them. But in the songs, the battlefield is described and the heroes are introduced with their characteristics.

**Keywords:** Dengbêj, Kilam, Ottoman archives, The Battle of Gameshvan, Haydaran tribe.

### Özet

Gameşvan Çatışması, 20. yüzyılın başlarında meydana gelen ve çok sayıda insanın ölümüne yol açan Kürt tarihinin olaylarından birisidir. Bu çatışmada çok sayıda insan hayatını kaybettiğinden, dönemin devlet yetkilileri meseleyi ciddiye almış ve çatışmayı önlemek için daha fazla önlem alınmasını talep etmişlerdir. Ayrıca bu olay, dengbejlerin şarkılarına da yansımıştır. Bu makalede, tasviri ve karşılaştırmalı yöntemle, 1907 yılında Gameşvan köyünde yaşanan çatışmanın nedenleri Osmanlı arşiv belgeleri ve dengbêjlerin şarkıları ışığında anlaşılmasına çalışılmış ve tarihi belgelerle dengbêjlerin sözlerinin birbirinden farklı olup olmadığı ortaya konulmaya çalışılmıştır. Bu bağlamda bu belgeler ve şarkılar karşılaştırılıp analiz edilmiştir. Yapılan araştırma sonucunda, belgelerde konuşan hükümet yetkililerinin tek kaygısının güvenlik sistemi ve istikrar olduğu, çatışmanın nedeni ve çatışma sonucunda kaç kişinin öldüğü gibi soruların onlar için önemli olmadığı ortaya çıkmıştır. Ancak dengbej şarkılarında çatışma alanı tasvir edilmiş ve kahramanlar özellikleriyle tanıtılmıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Dengbej, Kilam, Osmanlı arşivi, Gameşvan çatışması, Haydaran aşireti.

## Destpêk<sup>1</sup>

Di sala 1907an da li gundê Gamêşvanê (bi fermî Değirmendüzü) ku li Patnosa navçeya Agiriyê dimîne, di nava Torina Mala Şero bi xwe da pevçûnekê rû daye û qederek însan hatine kuştin ku Gamêşvan wê hingê girêdayî Erdîşê bûye. Ji ber ku di nava Kurdan da sazî yan jî dezgehêk tune ye ku peywira tomarkirina bûyeran an jî nivîsîna dîrokê bi cih bîne, ev bûyer û bûyerên bi vî rengî di nava rûpelên dîrokê da wenda dibin û tên jibîrkirin. Lêbelê hin faktor û amraz hene ku nahêlin ev qewam bi temamî di bin xweliya demên borî da bimînin û bîn jibîrkirin. Ji van amrazan yek jê wesîqeyên dîrokî ne ku ji hêla peywirdarên dewleta serdest a çaxa xwe hatine nivîsîn û arşivkirin, ya duyem kilamên dengbêjan in û ya sêyem jî bîr û hafizeya civakê ye. Di vir da divê em wê yekê destnîşan bikin ku arşîva Osmanî û kilamên kurdî di xebatên biwarê çand, dîrok û folklorê kurdî da zemîneke dewlemend raberî mirov dike. Bi taybetî di nirxandina kilamên kurdî da nêrîneke xweş dabîn dikin ji bo xebatên dîrokî yê derheqê kurdî û kurdan da û bi saya serê van lêkolînan meriv valahî û kêmasiyên dîroknivîsîna fermî ya akademîk jî dikare bibîne (Yüksel, 2023, r. 136). Rêyeke xweş ya ronîkirina van qewamên giring ên civakî jî belgeyên fermî yê dewletê bi xwe ne ku carcar ji bo zelalkirina paşxane yan jî karakterên di kilaman da (bnr. Yüksel, 2016, 2023) an jî hin aliyên rastî yê vegêranên dirêj ên wekî destanan dikarin berçav bikin (bnr. Kaplan, 2023; Subaşı, 2023). Ev xebat bi metoda wesfî û raberî (berawirdî) va xwe lê datîne ku di ser pêlikên amrazên navborî ra firqas bike û bi qandî taqeta xwe mijara Şerê Gamêşvanê li ber roniya wesîqeyên dîrokî û kilamên dengbêjan vekole.<sup>2</sup> Lewra bi qasî wesîqeyên dîrokî, tekstên kilamên dengbêjan jî giring in û di warê ronîkirina serdemên borî da agahiyan vedihewînin. Di vê babetê da Yüksel jî destnîşan dike ku çî ji dengbêjên berî xwe hîn bûbin çî jî ji serpêhatiyên xwe sêwirandibin, vegêranên helbestkî yê dengbêjan ji qeydên dîrokî yê kêmdîtî ne ku gihîştine ber destê me (Yüksel, 2019, r. 326). Ji lewma jî gelekî muhim e ku di lêkolînen akademîk da sûd ji tekstên kilamên dengbêjan jî were wergirtin.

Ji aliyekî din va gelekî giring e ku ew yek were tesbîtkirin, ka wesîqeyên dîrokî û tekstên kilamên dengbêjan di vê mijarê da bi çî rengî li hev dikin û li ser kîjan aliyên ji hevdu dûr dikevin. Di vê çarçoveyê da ji bo vê xebatê me wesîqeyên Arşîva Osmanî (Devlet Arşivleri Başkanlığı Osmanlı Arşivi), herdu pirtûkên Kemal Süphandağ<sup>3</sup>, kilama ku Aslıqa Qadir, Dengbêj Evdilkerîmê Patnosî û Dengbêj Maşelayê Mûşî dibêjin, bi kar anîn. Herwesa di beşa peywenda dîrokî da me sûdeke mezin ji teza doktorayê ya Erdal Çiftçi ya bi navê “Fragile Alliances in the Ottoman East: The Heyderan Tribe and the Empire” (Îttifaqên Qels li Rojhilatê Osmaniyan: Eşîra Heyderan û Împaratorî) wergirtin.

Ev xebat ji destpêkek, sê beş û encamekê pêk tê. Di destpêkê da me qala armanc û giringiya

1 Heta ev gotar kamil bû, alîkariya gelek kesan gihîşt min û lewma ez dixwazim li vir spasiya wan bikim. Di serî da ez sipasiya mamosteyê hêja Dr. Mehmet Rêzan Ekinici dikim ku di xwendina hinek cihên têlxirafên Seraşker Riza da alîkariya min kir. Dîsa mamoste Dr. Ömer Delikaya jî bi xwendin û pêşniyazên xwe rê ji min ra xweş kir, sipasiya wî dikim. Herweha edîtorê Kurdiyatê Dr. Yakup Aykaç, edîtorê qadê Dr. Kenan Subaşı, hekemên navnediyar bi pêşniyaz û rexneyên xwe kirin ku gotar bikemile, ez malavayîya tevan dikim.

2 Di destpêkê da me plan kir ku em vê gotarê li ser sê lîngan ava bikin ku ew jî wesîqeyên dîrokî, kilamên dengbêjan û hafizeya civakî bûn. Li gorî îmkanan me wesîqeyên dîrokî û kilamên dengbêjan biter kirin û di vê xebata xwe da bi kar anîn. Lêbelê lingê sêyem, kulek ma. Digel ku me pir hewl da û di vê çarçoveyê da me peywendî bi 3-4 kesan ra danî jî, lêbelê em bi ser neketin ku ji nava gel bi şarezayekî mijarê ra hevpeyvîne bikin û di xebata xwe da bi kar bînin. Divê em di vir da diyar bikin ku helbet me şarezayekî mijarê dît ku dikaribû salix bidaya, hetta ewil qebûl kir ku salix jî bide, lêbelê di pey ra bêyî ku sedemêk destnîşan bike, xwe jî mijarê vekîşand û hevpeyvîne encam neda. Dema me bi kesê navborî ra peywendî danî yê ewil qebûl kir ku hevpeyvîne bike û dî ra xwe jê vekîşand, diyar kir ku ew bi mijarê dizane û heta bi çend hevokan mijar îzeh jî kir. Di wê îzehê da derket holê ku salixdana wan, ji ya Mala Paşê (ku di pirtûkên Kemal Süphandağ da derfeta îfadeyê dîtiye) hinekî cudatir e. Ji lewma jî em texmîn dikin, ji ber ku argumenta wan û ya Mala Paşê nakok e û herweha mijar jî mijareke hesas e û temasî meseleyên eşîrtiyê dike, kesê navborî dîl nekir ku li ser meseleyê xeber bide.

3 Süphandağ, K. Büyük Osmanlı Entriğası Hamidiye Alayları. İstanbul, Weşanên Komal, 2006; Osmanlı Arşiv Belgelerinde Heyderan Aşireti ve Ağrı Direnişi, İstanbul, Pel Yayınları, 2021.

mijarê kir. Me beşa yekem ji bo peywenda dîrokî ya mijarê terxan kir û herweha me bi kurtenêrînekê cih da dîroka malbata Torina Mala Şero. Di beşa duyem da jî em li ser Şerê Gamêşvanê rawestiyen ku mijara esasî ya vê gotarê ye. Di vê beşê da me wesîqeyên dîrokî û herweha kilamên dengbêjan ên li ser mijarê parve kirin. Herweha di beşa sêyem da jî me hewl da ku em van wesîqe û tekstên kilaman bikin ber şirove û analîzan. Di beşa encamê da jî me cih da wan encamên ku me bi vê xebatê bi dest xistin.

### 1. Peywenda Dîrokî

Heyderan wekî eşîreke konfedere û rêkxistî di dawîya sedsala 19em û destpêka sedsala 20em da cihê xwe yê di nav rûpelên dîrokê da wergirtiye û herweha di vê heyama dîrokê da bi pêşengiya Torina Mala Şero va ev rola xwe mezin lîstîye û li herêmê bûye hêzeke sereke. Mihemed Emîn Zekî Beg diyar dike ku Heyderan ji eşîrên Kurdan ên herî mezin e, ji Mûşê heya Êrmiyeyê li her derê hene, koçer in û herweha sî hezar mal in (Zekî Beg, 2002, r. 261). Diyar e ku Zekî Beg ev agahiya xwe ji Mark Sykes wergirtiye. Lewra agahiyên Zekî Beg û yên Sykes nêzîkî hev in û herweha Zekî Beg diyar dike ku wî di xebata xwe da ji Sykes jî sîd wergirtiye (Zekî Beg, 2002, r. 235). Li gorî Sykes jî bîst hezar konên Heyderiyen hene (Sykes, 1908, r. 478).

Li gorî wesîqeyê arşîva Osmanî (Çiftçi, 2018, r. 28; Kaya, 2022, r. 495), pêşiyên eşîra Heyderan digihîjin Silîvaya (Farqîn) navçeya Diyarbekirê ku di wextê xwe da paytextê Merwanîyan bû. Li gorî wesîqeyê, Heyderan li Meyafarqînê (Silîva/Sîlvan) êleke şaxa Zîlan in, xwedan 31 konan in û dîroka wê jî vedigere sala 1540î. Her di vê çarçoveyê da Kaya bal dikişîne, ji nivê yekem ê sedsala şanzdehan û pê va eşîra Zîlan ji ber zêdebûna nifûsê û herweha ji ber sedemên civakî, aborî û siyasî ber bi deverên cuda yên coxrafyaya Osmanî belav bûye (Kaya, 2022, r. 491) û herweha nexasim ji ber çêre û zozanên wê, koçî herêma Serhedê (Bazîd, Erzirom, Qers û Mûş) kiriye (Kaya, 2022, r. 493). Dîsa li gorî wesîqeya ku Çakır (2023, r. 135) di xebata xwe da parve kiriye jî Heyderan li Senceqa Meyafarqînê ya eyaleta Diyarbekirê şaxeke eşîra Şikakî ne û ji wir bar kirine çûne aliyê Mûş û Wanê. Lêbelê Çiftçi (2018, r. 34) diyar dike ku agahiyên der barê peywendîya Heyderan û Şikakan da ne zelal in û herweha nakok in û hin lêkolerên hevdem jî bêtî ku vê agahiyê di bêjîngê ra derbas bikin, bi dest xwe ra pejirandine û îdia kirine ku Heyderan şaxeke Şikakiyan e. Lêbelê di vê mijarê da meriv dikare wê yekê bêje ku Heyderan ne şaxeke Şikakiyan in, lê pêkan e ku di heyameke diyar a dîrokê da rêkeftin pêk anîbin û bûbin mitefîqê hev. Çawa ku di nivê sedsala XVIIem da digel Rojkiyan (Çiftçi, 2018, r. 24)<sup>4</sup> û heya nivê sedsala XIXem jî digel Ademiyan (Çiftçi, 2018, r. 297) îttifaq pêk anîne, mumkin e ku Heyderan demekê digel Şikakiyan jî rêkeftin pêk anîbin û bûbin mitefîq. Herwesa bi qasî ku Kor Huseyîn Paşa ji Elî Emîrî ra salix daye, bav û kalên wan di heyamekê da ya ew pê nizanin, ji Meyafarqînê koçî herêma sînorê bakur ê Osmanî-Îranê kirine (Çiftçi, 2018, r. 53).

4 Di wergera bi Tirkiya îro ya Seyahetnameya Evliya Çelebi da navê "Heyderî" derbas dibe, lêbelê di çapa Osmanî ya sala 1898an da ev agahî tuneye (Çelebi, 1898, r. 227).

### 1.1. Tebeqeya Rêveberiya Heyderan: Torina Mala Şero<sup>5</sup>

Piştî ku mîrnîşîniyên Kurdan ên dawîn ji aliyê Dewleta Osmanî va bi plan û hêza leşkerî va ji holê hatin rakirin (Bruinessen, 2010: 200), li herêmê şûna desthelata kevnare û irsî ya mîran, eşîr xurt bûn û rola wan di qada siyasî da derket pêş. Herwesa li gorî gotina Ulugana, di demekê da ya ku otorîteya navendî nikaribû hebûna eşîran ji holê rake ku piştî tesfîyeya mîrektiyên xurtir û qewîntir bûn, coxrafyaya Kurdistanê bi sê aktorên nû ra nasiya xwe da hev: Şêxên Xalidî yên bi şaşîk, mîsyonerên Rojavayî yên bi şewqe û rêveberên Osmanî yên bi fes/kumê sor (Ulugana, 2022, r. 65). Di atmosfereke bi vî rengî da stêrka Torina Mala Şero biriqî û bi rasthevhatina politîkaya Padişahê Osmanî Evdilhemîdê duyem va ya biryara avakirina Alayên Hemidiye da, rol û hêza malbatê berçavtir û mezintir bû.

Di vê serdemê da li herêmê eşîrên herî xurt ên bi hejmara alayên xwe va derketin pêş, Heyderan, Hesenan û Milî ne. Heyderan li wilayetên Wan û Erziromê heft alay, Hesenan li devera Milazgirê pênc alay û eşîra Milî ya bi serkêşîya Îbrahîm Paşayê Milî jî li devera Wêranşarê pênc alay damezirandin (Ekinçi, 2017, r. 718) û di heyama xwe da bûn sê hêzên sereke yên herêmê.

Navê Mala Şero ji Şerîf Mihemed Beg tê ku di sedsala XIXem da yek ji serkirdeyên Heyderan e (Çiftçi, 2018: 25). Mala Şero bi hêz û rola xwe va bûye elîtên konfederasyona Heyderan û endamên malbatê, şax û baskên konfederasyonê bi rê va birine. Bo nimûne, dema ku li ser pêşniyaza Fermanarê Artêşa Çarem Muşîr Zekî Paşa di destpêka salên 1890î da (Eraslan, 1997, r. 462) bi telîmata Evdilhemîdê duyem xebatên avakirina alayan dest pê dikin, serekên eşîra Merxuran jî li hev dicivin da ku alayekê ava bikin ku fermanarê wê jî ji Merxuran be. Lêbelê serekên baskên malan ên eşîrê li hev rûnanên û ji bo femandariya alayê, yekî ji nav xwe naneqîn. Li ser vê yekê erkê femandariya alayê pêşniyazî Huseyîn Paşa dikin. Di vê gavê da Huseyîn Paşa jî bi şertê vî tekîfa Merxuran qebûl dike ku şertê wî jî ew bûye ku ji hêla dîsîplîn û techizatê va tu kêmasiyeke alayê dê tunebe. Ji ber vî şertê Huseyîn Paşa, alaya ku ji hêzên Merxuran pêk tê, dibe alaya herî birêkûpêk û ji herdu teftîşan jî bêyî qusûr û kêmasî derbas dibe (Avyarov, 1995, r. 250).

Ji aliyekî din va dema em awirekî didin dîroka Torina Mala Şero, em dibînin ku çî di nava malbatê da bi xwe, çî bi baskên din ên konfederasyonê ra û çî jî bi eşîr û konfederasyonên din ra Torina Mala Şero ketine nav gelek şer û pevçûnan. Ji şerên navxweyî yên Mala Şero yê herî navdar Şerê Gamêşvanê ye ku mijara vê meqaleyê ye. Ji bo şerê di nav baskan da jî em dikarin şerê Mala Şero yê bi Merxuran ra (BOA.DH.TMIK.M.270/84) wekî nimûne destnîşan bikin. Heyderan û Hesenan û herweha Heyderan û Celalîyan, Heyderan û Takoriyan jî gelek caran ketine rikeberiya hêzê û berê tîfingane dane hev (Demirci û Çabuk, 2014, r. 82-83; Aydın û Çiftçi, 2021, r. 158; Süphandağ, 2021, r. 39, 49). Der heqê şerê van eşîrên navborî da di arşîva Osmanî da jî gelek belge hene ku Süphandağ di pirtûka xwe ya navborî da cih daye wan.

<sup>5</sup> Li gorî Alakom, di zimanê kurdî da "torin" wekî peyv tê maneya kesên esilsaze, aristokrat û bijarte û herweha wekî tîgîh jî tê çend maneyên cuda yên wekî nav û sîfet, navê tebeqeyekê, navê malbatekê yan jî navê qebileyekê (Alakom, 2009, r. 21-22). Helbet di nav kurdan da bi navê "Torin" qebileyekê heye û em vê di listeyên civaknasan da jî dibînin. Lê "torin" a li vir amaje bi tebeqeyekê, bi malbatekê dike ku ew xwe wekî tebeqeya bijarte û rêveber dibînin û dihesibînin. Li vir dema em dibêjin "Torina Mala Şero", em tebeqeya rêveberiya eşîr yan jî konfederasyona Heyderan qesd dikin. Lewra wekî ku Ulugana ji Randot vediguhezîne, di organizasyona civaka kurdan da du tebeqeyên sereke hene ku ew jî "eşîr" û "reaya" ne (Ulugana, 2022, 318). Di serdemê mîrektiyên kurdan da ev cudabûn, bêtir aşîkar û li ber çavan e. Lewra ev yek xwe di malikên Feqiyê Teyran da wiha dide der: "Gul dibê ev lawê ras ne/Mîr li kurmancan qiyas ne/Te ji destê min xelas ne/Ho li te didim muhletê" (Teyran, 2022, r. 131). Ango "Gul ji lawîk ra dibêje ev ne rast e, ma qet di navbera Mîr û yekî Kurmanc da qiyas dibe, tja te tune ji destê min xilasi, ha ji te ra didim muhletê."

## 2. Şerê Gamêşvanê

Şerê Gamêşvanê li gundê Gamêşvanê yê Patnosê di sala 1907an da di navbera serkirdeyên Heyderan ên hêzên Huseyîn Paşa û Emîn Paşa da qewimiye. Ji ber ku konfederasyona Ademan jî beşdariya vî şerî kiriye û rabûye piştê hêzên Emîn Paşa, jê ra “Şerê Heyderan û Ademan” jî tê gotin. Ademan heya nîveka sedsala 19em şaxeke Heyderan bûye. Ji vê dîrokê şûnda wekî eşîreke serbixwe organîze bûye (Çiftçi, 2018, r. 297). Şerê Gamêşvanê herçiqaş wekî şerê Heyderan û Ademan were binavkirin jî lê ev şer di rastiya xwe da yê Heyderan bi xwe ye. Lewra cihê ku şer lê qewimiye dikeve hînterlanda desthelata Heyderan û Torina Mala Şero.

Dema meriv li dîroka Mala Şero dinihêre, meriv dibîne ku di serê ser da nakokî û berberî di nava malbatê da heye. Malbat ji seriyekî bêtir bi awayekî pîrserî dixuyê. Ji yekbûn û tifaqê bêtir malbat bi şîraq e. Di rastiya xwe da ji xeynî vî şerê navxweyî, eşîr bi xwe jî radibin hemberî hev û şerê hevdu dikin. Di arşîva Osmanî da belgeyên têkildarî şer û pevçûnên eşîran hene û Kaya jî gelek ji van belgeyan ên têkildarî şerê eşîrên li wilayeta Erziromê tomar kirine (Kaya, 2021, r. 971-987). Herweha ev nakokîya di navbera serekên malbata Şero da di belgeyên Osmanî da bi eşkereyî li ber çavan e. Lewra di dema avabûna Alayên Hemidiyeyê da her kurapekî cuda cuda xebatên damezirandina alayan meşandine û ala ava kirine. Di vê serdemê da rikeberiya di navbera kurapan da ku Huseyîn, Emîn û Hecî Temir Paşa ne, gurtir bûye. Huseyîn Paşa çar alay, Emîn Paşa du alay û Hecî Temir Paşa jî alayek ava kirine. Lê ji ber ku paşatiya wî ji mulkiyeyê bûye, Emîn Paşa ferdariya alayan wekî fermî spartiyê birayê xwe Qaymeqam Elî Beg (Süphandağ, 2006, r. 335).

Herweha kurapan her yekî jê li devereke cuda hêza xwe edilandibû, bakur û rojavayê Patnosê di bin bandora Huseyîn Paşa da, gundên nêzikî Erdîşê di bin bandora Emîn Paşa da û gundên bi ser nehiyeya Kosa (Sarîsu) jî di bin bandora Hecî Temir Paşa da bûn (Çiftçi, 2018, r. 275). Van serekên Heyderan pîrî carî êrîş dibirin ser gundên hev, nexasim jî gundên Ermenîyan diketin ber van êrîş û şêlandinan. Ji ber zêdebûna êrîşên bi vî rengî, hersê serekên navborî di Rêbendana 1898an da bo Stenbolê hatin veguhestin û tewqûfkirin (Çiftçi, 2018, r. 299). Lê piştî ku teahud dan îradeya şahane ku dê êdî bi rik tevnegerin, îstiqrarê têk nebin û li rêya hev biçin, ev hersê serek hatin berdan û vegeyîyan memleketên xwe.

Hersê kurap piştî ku vedigerin memleket, ji bo demeke dirêj di bédengiyê da dimînin û na-kevin nav şer û pevçûnan. Lêbelê di sala 1907an da li gorî gotina Süphandağ, Evdîla Begê Qaymeqamê Patnosê yê kurê Huseyîn Paşa hêzeke bi qasî sed mirovî dişîne ser gundê Ermenîyan ê bi navê Gamêşvanê yê li hînterlanda Emîn Paşa (Süphandağ, 2006, r. 418). Lê Emîn Paşa jî bi gotina amiyane, ne di guhê gê da bûye, wî jî tedbîra xwe sitandiye, li dora gund kozik dane kollandin, herweha birayê wî Elî Beg jî li şênîyên gund ên Ermenî çek belav kirine (Çiftçi, 2018, r. 308). Di van şert û mercan da hêzên Huseyîn Paşa yê êrîş birine ser gundê Gamêşvanê, ji nivî zehftir hatine kuştin. Li gorî Süphandağ, qedera 80 çekdar di vî şerî da hatine kuştin ku di navê da mîrxasên Huseyîn Paşa yê wekî Êşkê Bozo yê Xelkî û Mûsayê Zorav yê Laçekî jî hebûne (Süphandağ, 2006, r. 418).

Dîsa li gorî ku Çiftçi ji çavkaniyên zarî vediguhezîne, ji ber ku diya Emîn Paşa keça serokê eşî-

ra Ademan bûye û mêla Ademiyan li ser Emîn Paşa bûye, di vî şerî da jî piştgirî dane hêzên Emîn Paşayî (Çiftçi, 2018, r. 297). Beramberî vê yekê, Sîpkîyên li Dutaxê jî alîkarî dane Huseyîn Paşa.

### 2.1. Şerê Gamêşvanê di Wesîqeyên Dîrokî da

Di Arşîva Osmanî da bi zarê belgeyan tê diyarkirin ku Paşayên Eşîra Heyderan bi hev çûne (BOA, Y.MTV, 299/125 H-16-05-1325) û divê demildest ev pevçûn û rageşî bê bidawîkirin, lewra ji ber vî şerî xelkê deverê pir zirardê bûye (BOA, BEO, 3091/231789 H-21-05-1325) û herweha her di vê navberê da du hefte şûnda jî hatiye diyarkirin (BOA, DH.TMIK.M, 249/31 H-02-06-1325) ku nakokî û berberiya di navbera Paşayên Heyderiyan da hatiye çareserkirin.

Hem di telxrafa Seresker Riza da û hem jî di ya wilayeta Erziromê da fikara ku herî zêde dertê pêş, ew îhtimal e ku bi beşdarîkirina eşîrên din va ya di şer da, asayîş dê bi temamî tîk biçe û îstîqrar dê nemîne. Lewma di herdu telxrafan da jî tê xwestin ku tedbîrên di cih da demildest bînin sitandin. Dîsa di telxirafa Wilayeta Erziromê da diyar e ku yê herî zêde mirov li dora xwe kom kirine û dikeve liv û tevgerê, Huseyîn Paşa ye. Di vir da herweha tê diyarkirin ku şerê di navbera kesên navborî da ji zû da ye didome û di serdema ziraetê da yê herî zêde zirarmend dibe jî gel e. Dîsa em dibînin ku di vir da tê gotin ku paşayên mezkûr bi saya serê Padişah bûne xwedan meqam û pile, lêbelê ji ber nezanî û cahiliyê, karên kirêt û sosret dikin û herweha zordestiyê dikin û xwîne dirêjin. Lewma jî tê xwestin ku layenên şerker bi awayê herî giran bînin cezakirin da ku careke din teşebusî karekî wiha nekin.

Wekî di wesîqeyan da jî diyar e, Huseyîn Paşa ji Emîn Paşa û birayê wî Qaymeqam Elî Beg û herweha Temir Paşa xurtir û serdestir e. Ev yek ji hejmara alayên damezirandine jî diyar e, lewra Huseyîn Paşa bi serê xwe çar alay ava kirine. Helbet ev xurtbûna wî xwe dispêre hêzên baskan ên eşîrên din ên di bin baskê konfederasyonê da. Lewra Süphandağ jî bal dikişîne ku hêza Huseyîn Paşa ne ku ji Mala Şero ya ku mensûbê wê ye, belkî ji piştewaniya efradên din ên eşîra Heyderan tê (Süphandağ, 2006, r. 335). Bo nimûne, wekî me li jor jî behs kiribû, eşîra Merxurî sercem li cem Huseyîn Paşa ne û Alaya Siwariyên Sivik a 25em a ji hêzên Merxuran pêk tê di bin ferman-dariya Huseyîn Paşa da ye.

Wekî me li jor jî diyar kir, hê berî ku pileya paşatîyê werbigirin, şer û pevçûn di navbera endamên Torina Mala Şero da qewimîne. Di belgeyên arşîva Osmanî da em dibînin ku Huseyîn avê-tîye ser mala Hecî Temir ku belge wan wekî “axa” diwesifînin û ji ber vê çendê jî daxwaz hatiye kirin ku Huseyîn Axa were cezakirin (BOA, DH.MKT, 1543 90 H-11-01-1306; BOA, DH.MKT, 1546 58 H-18-01-1306). Herweha em ji belgeyan hîn dibin ku wextê hukmê wan hebûye, zarokên şexsên navborî jî ev rikeberî û herweha şer û pevçûn domandine (BOA, MKT.MHM, 666 24 H-15-01-1313).

Di hedê zatê xwe da ev avêtina bi ser malê da nîşanî me dide ku yê zordest Huseyîn Paşa ye. Herweha divê meriv di vir da wê yekê jî bîne ziman ku gava meriv li wesîqeyên Osmanî dinihêre, meriv dibîne ku endamên Torina Mala Şero di tebeqeya herî bilind da qet ji hev nehewîne, timî belapêjgarî hev bûne û gava konjonktur guheriyê û bi politikaya Ebdulhemîdê Iiyem hêzeke bêtir kesb kirine û hêza wan qaîmtir bûye, bêtir ketine pêşîra hev.

Li gorî belgeyeke din jî mirovên Qaymeqam Elî Begê birayê Emîn Paşa agir berdane tîrên (zeviyên genim) Mîrlîwa Huseyîn Paşa. Ev jî nîşanî me dide ku Elî Beg û Emîn Paşa li hemberî Huseyîn Paşa qels in û tiştta ku ji destê wan tê, agirdadayîkirina zeviyên genim e. Ji dîroka wesîqeyê diyar e ku heyama, heyama tîrdîrûnê ye û zeviyên hatine şewitandin jî tîr in (BOA, DH.ŞFR, 372/9 R-07-08-1322).

Me li jor jî diyar kir ku devera di bin kontrola Huseyîn Paşa da bakur û rojavayê Patnosê ye, ya di bin kontrola Emîn Paşa da jî bêtir gundên nêzîkî Erdîşê ne. Gamêşvan wekî coxrafya digel ku nêzîkî Patnosê ye, wê hingê li ser qezaya Erdîşê dixuyê (BOA, DH.ŞFR.190/80) û şênîyên wê jî bi giranî Ermenî bûne. Bi ihtimaleke mezin, ji ber ku girêdayî Erdîşê ye Emîn Paşa difikire ku li herêma wî dimîne û heqê bacê yê wî ye û herweha ji ber ku nêzîkî Patnosê ye jî malbata Huseyîn Paşa wisa difikire ku ev heq, yê wan e. Ji xwe dema em li van herdu (BOA, BEO, 768/57565 H 08-11-1313/BOA, DH.ŞFR. 190/80 R 07-12-1312) belgeyan dinihêrin, em dibînin ku di sala 1897an da ango 10 sal berî şerê Gamêşvanê, birayên Emîn Paşa, Evdillah, Edo û Elî û herweha biraziyên wî êrîş birine ser gundê Gamêşvanê, hinek emwal û pênc sed exnam xesb kirine (exnam, baca şer'î ye), du mêr û jinek kuştine, du kes jî birîndar kirine.

## 2.2. Şerê Gamêşvanê di Kilamên Dengbêjan da

Şerê Gamêşvanê di kilamên dengbêjên herêma Serhedê da û nexasim jî di yên devera Patnosê da pir deng vedaye. Dengbêjên wekî Hecî Evdilkerîmê Patnosî, Maşelayê Mûşî, Kemalê Kûçeka û Hecî Adil kilama li ser Şerê Gamêşvanê ya bi “Delal hay delal”ê va dest pê dîke, gotine. Dîsa di Radyoya Rewanê da jî hunermend Aslîka Qadirê ev kilam gotiye ku wiha dest pê dîke:

Lo axawo şerekî li me çêbû li Gamêşvanê Tozîbelanê li devê avê  
Eskerê Huseyîn Paşayê Heyderî giran e derketiye ji Patnosê xwe da navê (Maşelayê Mûşî, dq. 0:57)

Delal qurban tu delal î

Were hey delal gazî ye xweş hewar e (Aslîqa Qadir, dq. 0:35)

Bê axawo şerê li me qewimî Gamêşvana şewitî li derî avê

Lo maqûlo qaleka li me qewimî Gamêşvana kavi li derî avê

Eskerê Zor Huseyîn Paşa derket ji Patnosê (Hecî Evdilkerîm, dq. 09:00)

Dema em dengbêjan guhdarî dîkin, em dibînin ku kilam bi sehneya şer dest pê dîke û diyar dîke ku li Gamêşvanê wa ye şerekî mezin diqewime û herweha gazî û hewarî ye. Di pey ra jî tê diyarkirin, yê ku eskerê wî giran e û herweha şer daye destpêkirin, Huseyîn Paşa ye. Lewra li ser zarê dengbêjan tê îfadekirin ku wa ye eskerê Huseyîn Paşa bi hezarî ye û dikişe, diçe şer.

Were hewarî hewarî hewar hewarî

Bavo îro li Gamêşvanê agir barî

Her çar gundê dora Kela Kudo bi serê min da mabû xirûxalî

Li ser serê eşîra Heydera da bûye gazî hewarî

Tu bala xwe bidê sala îsal orta Huseyn Paşayê Heyderî

Edoyê Hesên Axa bavo çawa bû neyarî (Maşelayê Mûşî, dq. 01:30)

Hele bala xwe binê derdê li ser derda yî



Orta Zor Huseyîn Paşayê Heyderî, Edoyê Hesên Axa bi resmen bavo bû neyarî (Hecî Evdîlkerîm, dq. 08:41)

Di vir da em dibînin ku dengbêj diyar dikin ku ev şer, şerê xwebixwetiyê yê Heyderan e ku li aliyekî Huseyîn Paşa heye û li aliyê din jî mala Hesên Axa heye.

Min dî Edoyê Hesên Axa bi sê dengên bang dikir  
Gelî hevalan çê bin çê bixebitin  
Hûn ê lêxin Êskê Bozo Mûsê Zorav bikujin  
Cinazê van xweşmêran bidine li ber tavê (Maşelayê Mûşî, dq. 01:15)  
Edoyê Hesên Axa kire gazî  
Go, Fariz Mihemedê Şana, Evdîlê Muslî bavê min bi lawo mêr bin çê bisekinin

Em ê bikujin Êskê Bozo, Mûsê Zorav termê van zilaman bidem ber tîra tavê (Hecî Evdîlkerîm, dq. 09:25)

Piştî ku eskerên Huseyîn Paşa dikişin û nêzîkatiyê bi cihê şer dikin, Edoyê Hesên Axa dide bin çenga mêrxasên xwe û jî wan ra dibêje ku xwe jêhatî bikin, em ê lêxin wan xweşmêran bikujin. Li gorî ragihandina dengbêjan, em dibînin ku li meydana germ a şer, kurê Hesên Axa, Qaymeqam Elî Beg birîndar dibe û herweha xweşmêrên Huseyîn Paşa, Êskê Bozo û Mûsê Zorav tên kuştin. Em vê yekê jî zarê Êskê Bozo hîn dibin ku dibêje, “Heyran wele ez du gula birîndar im destê min nagire qevda mîrata modolyê (Maşelayê Mûşî, dq. 07:45).” Helbet ev, agahiyeke rasterast e ku destnîşan dike kê birîndar e û kuştî ye. Lê em jî gotina “Tê zarîna qîz û bûkan lûbelûbê jinebiyan e (Maşelayê Mûşî, dq. 08:30); Weyle wêlê qîza li bûka, jinebiyan e (Hecî Evdîlkerîm, dq. 10:05).” fam dikin ku bîlançoya şer gelekî giran e. Lewra gelek qîz mane bêbav, gelek bûkên destbîhene û jin mane bêmêr û bûne jinebî. Her bi vî awayî dengbêj bi pesn û medh Edoyê Hesên Axa bi birîntînin û dawiyê li kilama xwe tînin.

Gava em li kilaman dinihêrin em dibînin ku dengbêj dema bûyerê vediguhezîne, agahiyan dide, teswîran dike, hetta carinan bi eşkereyî û carinan jî bi awayekî remzî û nerasterast mêl û sempatiya xwe jî bo layenekî nîşan dide. Ji vê hêlê va jî bo Şerê Gamêşvanê em dikarin bêjin ku dengbêjan der barê bîlançoya şer da agahî dane, teswîra şer kirine. Li gorî vê, em dibînin ku ka kê birîndar bûye û kê hatiye kuştin û herweha şervanên herî bijarte yên layenan kê ne û aqûbeta wan çî ye.

Ji aliyekî din va gava em li handana navborî ya Edoyê Hesên Axa dinihêrin, em dibînin ku biryardayîna şer di derbekî da nebûye. Ev di pêvajoyekê ra derbas bûye û haya layenan jî hevdu hebûye. Ev jî nîşan dide ku Edo, di gund da kozik vedane, tedbîrên xwe wergirtine û hew karê mayîn jî handana mêrxasan bûye û ew jî, roja şer kiriye.

Di vir da belkî xala herî giring a divê em li ser rawestînin, layengirtina dengbêj e. Lewra çî dengbêj çî destanbêj, gava kilamekê, destanekê yan jî rûdanekê vediguhezîne, terefgiriya xwe jî nîşan dide, ango bi uslûb û şêwezarekî layengîr îcraya xwe dike. Hetta carinan hestên xwe jî tevî mijarê dike û fikr û rayeya xwe ya der barê waqîyê da derdibire. Bo nimûne, destanbêj di dema îcraya xwe da, veguhestina tekstê di carekê da radiwestînin û ya di dilê xwe da tînin

ziman. Helbet nîşandana vê terefgîriyê her carê bi heman rengî, bi awayekî eşkere pêk nayê. Em dibînin ku dengbêj rewş û dînamîkên civakê jî li ber çavan digire û li gorî wê tevdigere. Wekî ku Delikaya jî amajeyê pê dike, kilam [...] li ser fail û mexdûrên şîdetê terefgiriya xwe ya exlaqî ligel masûmiyeta sîvîlan tîne ziman (Delikaya, 2024, r.17).

Di vir da divê em wê yekê destnîşan bikin ku layenên bûyerê jî li ser uslûba vegêrana dengbêj tesîrê dikin. Ango heger kiryar, peywirdarên dewletê yan jî hêzeke biyanî û dereke be, ev îfadekirina bêgunehbûna sîvîlan a navborî, ji bo dengbêj hêsan dibe. Lêbelê hin rewş jî hene ku dengbêj nikare navê neheqiyê lê bike û jê ra bêje zilm. Belkî bi remzan û bi îfadeyên nerasterast vê neheqî û zilmê destnîşan dike û di vegêrana kilamê da di van rewşan da bi baldar tevdigere. Îja dema em li Şerê Gamêşvanê dinihêrin, em dibînin ku yekcar dikeve vê çarçoveyê. Lewra ji ber ku şer, şerekî xwebixwetiye ye, aliyên şerker mirovên hev in û di ser da jî mijar diçe digihîje meseleyên eşîrtiyê, dengbêj nikare navê neheqiyê lê bike û heq û neheqan bi eşkeryî destnîşan bike yan jî der heqê aliyekî da gotinên xirab bibêje. Şûna vê jî radibe, bi hin îfadeyên nixumandî va terefgîriya xwe nîşan dide. Dema em ji vê hêlê va li Şerê Gamêşvanê dinihêrin, em dibînin ku herçiqas bi eşkeryî nebe jî dengbêj, Huseyîn Paşa neheq dibînin. Lewra di kilaman da tê diyarkirin, yê ku eskerên wî bi hezaran dikişin û diçin şer Huseyîn Paşa ye. Ji xeynî vê, di kilaman da der heqê Huseyîn Paşa da çî erênî çî nerênî hema hema tu îfade tunene, çî heye bi tenê di versiyona Maşelayê Mûşî da wesfandina, “Huseyn Paşayê Heyderî lawo mija rû erdê ye (Maşelayê Mûşî, dq. 07:55).” derbas dibe.

Ev bêdengiya dengbêjan wê yekê nîşan dide ku naxwazin yan jî nikarin zordestiya Huseyîn Paşa bînin ziman. Lê gava mijar tê ser Hesên Axa û zarên wî, dengbêj pesnê wan didin û sempatiya xwe ji wan ra nîşan didin. Dengbêj diyar dikin ku Hesên Axa di wextê xwe da çiqas bihêz bûye û mîna mij û dûmana Çiyayê Sîpanê Xelatê dakutaye ser dijmin (Aslîka Qadir, dq. 01:05), kana tirs û xofê bûye, lê heyf û mixabin ku niha ew tune û tirsê wî jî nemaye. Herweha ji ber ku di şer da Eliyê kurê Hesên Axa birîndar dibe, dengbêj wî wekî mirê zirav tewsîf dikin (Aslîka Qadir, dq. 0:47) û dîsa payeyeke leheng û qehremanane didin Edoyê Hesên Axa û Edo derdixin asta serlehengên destanên Kurdî. Lewra di destanên Kurdan da serleheng bi cesaret û sexaweta xwe tînan naskirin û herwesa hespekî wan jî heye ku xwedan nav û karakter e. Di vir da ji bo Edo tê gotin ku siwarê Kurdo û bavê Silêman e (Hecî Evdilkerîm, dq. 10:15; Maşelayê Mûşî, dq. 08:35). Ango navek li dinyayê hiştiye ku kurê wî dikare pê serbilind be. Edo herwesa mêrekî wisa ye ku fena keleheke li deştê, xurt û zexm e, li jor penahê hawar û gaziye ku Xweda be, li jêr jî Edoyê Hesên Axa ye (Hecî Evdilkerîm, dq. 10:06; Maşelayê Mûşî, dq. 08:45). Îfadeya, “Cebilxanê Edoyê Hesên Axa ji kîsî canfidan e (Hecî Evdilkerîm, dq. 09:56).” jî ji bo Edo pesn û medhek e. Lewra tê diyarkirin ku mirovên wî jê ra yar in, tu wextî îxanetî wî nakin û ji bo wî canê xwe feda dikin.

Ji aliyekî din va di mijara xwedan nav û nasnamebûna hespê Edo da, divê em diyar bikin ku ev yek ne bi tenê tîkildarî destanên Kurdî ye. Ev yek belkî tîkildarî edetên Kurdan e ku di jiyana xwe ya gundewariyê da bi piranî dianîn nav li wan heywanan dikirin ku jiyana wan hêsan dikir yan jî di hin qonaxên jiyana da refaquetiya wan dikirin. Bo nimûne, Kurdan dianîn û nav li kûçik, tejjî, ga, ker û hespên xwe dikirin. Em dibînin ku Yüksel jî di vê mijarê da diyar dike ku Kurd çandinî û heywandariyê dikin û lewma jî ew yek di nav wan da rewşeke pir berbelav e ku navan nexasim li

heywanên kêrhatî û jêhatî dikin û navê hespê Ferzendeyê ji serkêşên Serhildana Çiyayê Agiriyê, Enzawir e û nimûneya vê yekê ye (Yüksel, 2019, r. 342-343).

### 2.3. Cudahiya di Navbera Wesîqe û Kilaman da

Herwesa dema em li wesîqeyên Osmanî dinihêrin, em dibînin ku destnîşan dikin, şerek qewimiye û hinek însan hatine kuştin û hinek jî birîndar bûne û hew. Ji bo rêveberên ji navendê hatine şandin ne muhîm e yên hatine kuştin kê ne, çîrokên wan çi ne û hetta ji bo wan hejmar jî muhîm nîne û lewma diyar nekirine ka hejmara kuştî û birîndaran çend e. Bi qasî ku dixuyê, ev yek zêde di xema şefên eşîrê yên xelkê herêmê bi xwe da jî nîne, lewra Ebdullah Begê kurê Huseyîn Paşa dema hêza xwe dişîne ser Gamêşvanê, bi xwe li Patnosê rûdinê û di atmosfereke aram da kişîka xwe dilîze (Süphandağ, 2006, r. 418).

Lêbelê dema em li kilamên dengbêjan guhdarî dikin ku dîroka alternatîf a gel û hafîzeyê civakî ye, em dibînin ku meydana şerî tê teswîrkirin û der heqê şer da agahî tên dayîn. Di vir da zimanê kilaman ne zimanekî bêlayan e, dengbêj dibe teref û ne pir bi eşkereyî be jî heq û neheqan destnîşan dike.

Cudahiyeke din a di navbera wesîqe û kilaman da jî ew e ku di wesîqeyan da navê Emîn Paşa pir derbas dibe, lêbelê di kilaman da qet derbas nabe. Şûna wî, navê birayê wî Edo bêtir derbas dibe û behsa wî tê kirin. Ev jî nîşanî me dide ku yê xwenda û ji mulkiyeyê Emîn Paşa di nezdê rayedarên dewletê da dibe mixatab. Lê di nav gelê herêmê da yê mixatab tê girtin jî Edo ye. Edo kurê mezin ê Hesên Axa ye û di temamî kilamên dengbêjan da yê derdikeve pêşîya me, ew e. Herweha wekî me li jor jî destnîşan kir, Edo tevî birayên xwe deh sal berî ku Şerê Gamêşvanê biqewime, êrîş biriye ser heman gundî ku di encamê da sê kes hatine kuştin.

### 2.4. Cudahiya di Navbera Kilaman da

Versiyona kilamê ya ku Aslıqa Qadirê di Radyoya Rewanê da gotiye, li gorî kilamên dengbêjên din kintir e û cih cihan jî hatiye sansurkirin û herweha navê lehengan tevlihev bûne û guherîne. Di vir da tê diyarkirin ku gula siwaran, ango mîrxasê herî bijare û dilêr, Îskanê Zero hatiye kuştin. Lê em dizanin mîrxasê hatine kuştin Êskê Bozo û Mûsayê Zorav in. Ango di vir da navê Êsko bûye Îskan û nasnavê Zorav ê Mûsa jî wekî Zero guheriye û ji Îskan ra bûye nasnav. Herweha navên mîrxasên mala Hesên Axa jî li gorî dengbêjên din guherîne û bûne Simbo û Sêvo. Dîsa dema dor tê ser rêzika ku dê wê yekê rave bike, eskerê Huseyîn Paşa derket û kişîya çû, peyvên nayên fêmkirin yên wekî “Bi gotinê eskerê *kura savde şaşêla têne sitka qûya gulla davên*”<sup>6</sup> tên gotin. Bi qenaeta me di vir da navê Huseyîn Paşa û salixdana wê hatiye sansurkirin. Lewra li dewlet û rejîmeke ku wisa dihesibîne hemû însan bira ne û herweha di radyoyekê da ya ku fikra “Kurd hemû bira ne” belav dike (Elend, 2021, r. 16), ravekirin û pesindana axayekî ku dewleta rikeber remza Paşatiyê dayê, yê ku “dibe sedema xwînretinê”, ne maqûl û muteber e. Di vir da dîsa bavê Emîn Paşa, Hesên Axa bûye Paşa ku di rastiyê da paşatiya wî tune. Herweha hatiye balkişandin ku Hesên Axa di wextê xwe da çiqas bihêz bûye û mîna mij û dûmana Çiyayê Sîpanê Xelatê, kana tirs û xofê bûye, lê heyf û mixabin ku niha ew tune û tirsê wî jî nemaye.

6 Di vê risteyê da nivê hevokê nayê fêmkirin. Dema meriv leza kilamê dadixe, peyvên famkirinê lêbelê îcar maneyeke wan çênabe. Herwesa Süphandağ di pirtûka xwe da (2021, r. 73) ev riste wekî, “*Bi gotinê eskerê Huseyîn Paşa jêr da tene gule davên*” nivîsiye.

Versiyona kilamê ya ku dengbêj Hecî Evdilkerîmê Patnosî dibêje, fena ya Radyoya Rewanê sê bend e. Di vê kilamê da em dibînin, çawa ku mêrxasên Huseyîn Paşa hene, bi heman rengî yên mala Hesên Axa jî hene ku navê wan Fariz Mihemedê Şana û Evdilê Muslî ne, pir dilêr û canfida ne û lê dixin, mêrxasên mala Paşê dikujin û termê wan li ber tîra tavê dihêlin.

Versiyona kilamê ya ku dengbêj Maşelayê Mûşî dibêje, şeş bend e û li gorî yên din hinekî dirêjtir e. Di vê kilamê da pir bi eşkereyî tê diyarkirin ku herdu hêzên rikeber, ne hevseng in û yên Huseyîn Paşa girantir e û bi hezarî ye. Bereksê kilamên din, di vir da tê diyarkirin ku ev şer, şerê Heyderan ê navxweyî ye û ev yek bi hevoka, “Li ser serê eşîra Heydera da bûye gazî hewarî.” tê îfadekirin. Dîsa jî vê kilamê û jî kilama Aslîka Qadirê em hîn dibin ku di şer da Eliyê Hesên Axa jî birîndar bûye ku bi gotina “mîrê zirav” va mêl û sempatiya ji bo Mala Hesên Axa di vir da jî tê îfadekirin.

Wekî tebîeta hemû şeran, di vir da bi gotina “Tê zarîna qîz û bûkan lûbelûbê jinebiyan e.” encama ji bo jinan hatiye destnîşankirin. Herçiqas rasterast nebin hedefa guleyan jî, lê di şeran da yên esil mexdûr dibin jin in, wekî di vir da jî tê gotin, hinek jê keç in ku bavê xwe ji dest didin, hinek jê bûkên destbihene ne ku mîrê xwe ji dest didin û hinek jê jî ew jin ku mîrê wan tê kuştin û dibin jinebî.

### Encam

*Şerê Gamêşvanê* di sala 1907an da li gundê Gamêşvanê yê niha li ser Patnosa navçeya Agiriyê ye, lê wê hingê li ser Erdîşa navçeya Wanê bûye, di encama rêkeberiya hêzê ya naxweyî ya malbata Torina Mala Şero (TMS) da qewimiye. Aliyên ku di vî şerî da hatine hemberî hev û mîr ji hevdu kuştine, hêzên Huseyîn Paşayê Heyderî û yên kurapê wî Emîn Paşa ne. Di vî şerî da jî ber ku hinek merivên eşîra Ademiyan rabûne piştê Emîn Paşa, ji bo vî şerî di heman demê da Şerê Heyeran û Ademan jî tê gotin.

Dema ku em bala xwe didin arşîva Osmanî, em dibînin ku di wesîqeyên li ser vî şerî da tesbîtên giring hene. Di van wesîqeyan da hatiye balkişandin ku ev rikeberiya di nava malbata TMSyê da mîlmilaneyeke kevn e, ji ber şer xelkê sivil ê deverê pir zirardîde dibe û lewma divê êdî teqez rê lê were girtin û teşebuskarên şer divê bî cizakirin. Dîsa di van wesîqeyan da hatiye diyarkirin, serokên eşîran bi saîqeya cehalet û zordestiyê li ser hidûd aramiyê tîk dibin û teşebusî xwînretîne dikin. Helbet em dîsa jî wesîqeyên dîrokî hîn dibin ku di pêşdatirî vî şerî da hem li Gamêşvanê bi xwe û hem jî li deverên din, serkirdeyên TMSyê ketine şer û pevçûnan. Hetta jî ber ku hêzên Emîn Paşa û birayê wî Qaymeqam Elî Beg ne hevsengî yên Huseyîn Paşa bûne, çûne agir berdane zeviyên wan ên genim.

Ji aliyê xwe va gava mirov li tekstên kilaman dinihêre, mirov dibîne ku hem teswîra meydana şerî hatiye kirin û hem jî qehremaniya lehengên sereke yên şer hatiye ravekirin û navê wan hatiye zikirkirin. Dîsa versiyona kilama li ser şer ya ku Aslîka Qadirê di Radyoya Rewanê da gotiye, li gorî kilamên dengbêjên din kintir e û cih cihan jî hatiye sansurkirin. Di kilamê da navê lehengan tevlihev bûne û guherîne û herweha rêza ku navê Huseyîn Paşa û eskerên wî derbas dibe, hatiye sansurkirin û di şûna wê da hin peyvên ku nayên fêmkirin hatine gotin.

Wekî xaleke cuda ya di navbera wesîqe û kilamên li ser vê mijarê da jî mirov dikare wê yekê destnîşan bike ku navê Emîn Paşa di wesîqeyan da pir derbas dibe, lê di kilaman da qet derbas nabe. Şûna wî, navê birayê wî Edoyê Hesên Axa derbas dibe.

Dema em li zimanê kilaman dinihêrin, em dibînin ku herçend bi eşkereyî nebe jî terefgîriyek xwe dide dest. Ji ber sedemên wekî şerê xwebixwetiyê û meseleyên hesas ên eşîrtiyê, dengbêj naçar mane ku terefgîriya xwe nerasterast îfade bikin. Di vê çarçoveyê da dema mijar bûye Huseyîn Paşa, dengbêjan sikût kiriye û dema mijar bûye Hesên Axa û lawên wî jî bi remz û teşbihan pesna wan dane û sedeqet û wefadariya mirovên wan derxistine pêş. Herweha dengbêjan di vî warî da bêtir cih dane Edoyê Hesên Axa û ew adeta derxistine asta leheng û qehremanên destanên Kurdî.

Wekî xala dawîn, li vir em dikarin wê yekê pêşniyaz bikin, lingê naqis ê ku me di destpêkê da amaje pê kir, divê di xebateke din da bê temamkirin da ku rastî û heqîqeta vê bûyera tarîxî bi awayekî objektîftir derkeve meydanê.

## Çavkanî

### Wesîqeyên Arşîva Osmanî

- BOA, DH.MKT, 1543/90 H-11-01-1306  
BOA, DH.MKT, 1546/58 H-18-01-1306  
BOA, BEO, 768/57565 H 08-11-1313  
BOA, DH.ŞFR. 190/80 R 07-12-1312  
BOA, MKT.MHM, 666/24 H-15-01-1313  
BOA, BEO, 1033 77406 H-06-06-1315  
BOA, BEO, 1034 77502 H-08-06-1315  
BOA, DH.TMIK.M, 43/6 H-15-06-1315  
BOA, DH.MKT, 2202/45 H-02-01-1317  
BOA, BEO, 1312 98340 H-11-01-1317  
BOA, DH.ŞFR, 372/9 R-07-08-1322  
BOA, Y.MTV, 299/125 H-16-05-1325  
BOA, BEO, 3091/231789 H-21-05-1325  
BOA, DH.MKT, 1153/47 H-03-02-1325  
BOA, DH.TMIK.M, 249/31 H-02-06-1325

### Jêderên Çapkirî

- Alakom, R. (2009). *Torin Arîstokratên Serhedê* (Çapa 2yem). Stenbol: Avesta.
- Avyarov (1995). *Osmanlı-Rus ve İnan Savaşlarında Kürtler 1801-1900*. Çev: Muhammed Varlı (Hoko Xanî), Ankara: Sîpan.
- Aydın, S. û Çiftçi, E. (2021). *İmparatorluğun Son Aşiret Sayımı Fihristü'l Aşâir Yorumlar ve Çeviriyazım*. İstanbul: İletişim.
- Bruinessen, M. V. (2010). *Ağa, Şeyh, Devlet*. İstanbul: İletişim.
- Çakır, İ. (2023). Mehmed Hurşid Paşa'nın Seyâhatnâme-i Hudûd Adlı Eserine Göre Osmanlı-İnan Sınır Aşiretleri: Celali, Zilanlı, Haydaranlı Ve Sıbki Aşiretleri. *İnan Çalışmaları Dergisi*, 7(1), 127-150. <https://doi.org/10.33201/iranian.1230814>
- Çelebi, E. (1898). *Evliya Çelebi Seyahatnamesi*. 4. Cilt. Derseadet: İqdam Matbaası.
- Çelebi, E. (2010). *Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahatnamesi*. 4. Cilt, 1. Kitap. İstanbul: Yapı Kredi.
- Çiftçi E. (2018). *Fragile Alliances in the Ottoman East: The Heyderan Tribe and the Emipre, 1820-1929, Ph.d. Dissertation*, Bilkent University.
- Delikaya, Ö. (2024). Navê Cihan, Mekanên Birê û Geliyê Zilan di Çanda Dengbêjiyê de. *Mukaddime*, 15(1), 15-40. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1453602>
- Demirci, S. û Çabuk, F. (2014). Celâli Kürt Eşkıyası: Bayezid Sancağı ve Osmanlı-Rus-İnan Sınır Boylarında Celâli Kürt Aşireti'nin Eşkıyalık Faaliyetleri (1857-1909). *International Journal of History*, 6(6), 71-97.
- Ekinci, M. R. (2017). "1897 Tarihli Hamidiye Hafif Süvari Alayları Taksimatı". *Şarkiyat* 9/2, 703-724. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.339530>.

- Elend, K. (2021). *Kimliği Terennüm Etmek Erivan Radyosu Kürtçe Yayını*. İstanbul: İletişim.
- Eraslan, C. (1997). Hamidiye Alayları, *İslam Ansiklopedisi, C. 15*. İstanbul: DİB Yayınları.
- Kaplan, Y. (2023). Ji Edebiyata Devkî ya Kurdî Serhatîyek Evînî: Salih û Kejê û Deqeke Çapkiri. *Mukaddime*, 14(1), 120-146. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1265178>
- Kaya, H. (2021). “18. Yüzyılda Erzurum Eyaleti’nde Yerel Siyaset Ve Yezidi Aşiretlerin Rollerini”. *Şarkiyat* 13/3, 971-987. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1000137>.
- Kaya, H. (2022). Diyarbekir’den Serhad’a Kadim Bir Aşiret: Zilan, *Aktör; Müttefik, Şaki Kürt Aşiretleri*, Der. Tuncay Şur-Yalçın Çakmak (s. 489-504). İstanbul: İletişim.
- Mehmed Hurşid Paşa (1997). *Seyahatname-i Hudud*. Çev. Alaatin Eser. İstanbul: Simurg.
- Subaşı, K. (2023). Fesad û Bêbext di Trajediya Evînê da: Weku Nimûne Destanên Evîna Mêjûyî. *Mukaddime*, 14(1), 148-176. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1243035>
- Süphandağ, K. (2006). *Büyük Osmanlı Entrikası Hamidiye Alayları*. Stenbol: Weşanên Komal.
- Süphandağ, K. (2021). *Osmanlı Arşiv Belgelerinde Heyderan Aşireti ve Ağrı Direnişi*. İstanbul: Pel Yayınları.
- Sykes, M. (1908). The Kurdish Tribes of The Ottoman Empire. *The Journal of the Royal Anthropological Institute of Great Britain and Ireland*, 38, 451-486.
- Teyran, F. (2022). *Dîwan*. (Werger û Şîkar: Kadri Yıldırım, Çapa 2yem). T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı Kütüphaneler ve Yayımlar Genel Müdürlüğü Yayınları.
- Ulugana, S. (2022). *Kürt-Ermeni Coğrafyasının Sosyopolitik Dönüşümü (1908-1914) Halidiler, Hamidiyeliler, Bedirhaniler ve Taşnaklar*. İstanbul: İletişim.
- Ulugana, S. (2022). Şiddet Yüzyılı İçinde Dört Sınır Aşiret: Hesenan, Cibran, Pencînarın ve Xweytî (1837-1937), *Aktör; Müttefik, Şaki Kürt Aşiretleri*, Der. Tuncay Şur-Yalçın Çakmak (s. 317-350). İstanbul: İletişim.
- Yüksel, M. (2016). On The Borders of Turkish and Iranian Nation States: The Story of Ferzende and Besra. *Middle Eastern Studies*, 52, 656-676.
- Yüksel, M. (2019). Dilşa’nın Babasına Ağıt: Ruslar, Dengbêjler ve Bulanık Savaşı, Çağlayan, E. (ed.) “*Burası Muştur*”: *Tarih, Toplum, Kültür ve Edebiyat* (s. 325-358). İstanbul: Pınar Yayınları.
- Yüksel, M. (2023). Besra, Zarife, Gulnaz ve Diğerleri: Arşiv Belgeleri ve Kürtçe Sözlü Anlatılarda Kadınlar. *Toplumsal Tarih Akademi*(3), 136-141.
- Zekî Beg, M. E. (2002). *Dîroka Kurd û Kurdistanê*. Stenbol: Avesta.

### Jêderên Online û Dîjîtal

Hunermend Aslıka Qadir:

<https://www.youtube.com/watch?v=BaHcIz5kUTI> (Guhdarîkirin, 07.01.2023).

Dengbêj Hecî Evdilkêrîmê Patnosê: <https://www.youtube.com/watch?v=0HbRCmmff4Q&t=623s> (Guhdarîkirin, 07.01.2023).

Dengbêj Maşelayê Mûşî:

<https://www.youtube.com/watch?v=u8QD0i--rTo> (Guhdarîkirin, 07.01.2023).

## PÊVEK

### Wergera bi kurdî ya têlxrafa Serasker Riza-1

Nimroya Arşîvê: Y.MTV.00299.00125.001

Meqamê Seraskerî/Mektûbê Qelemê Xusûsî

Di tezkîreya samiyeyê (sadaret) da ya ji Babê Eliyeyê hatiye şandin, hatiye diyarkirin ku di navbera serokên Eşîra Heyderan Mîrlîwa Huseyîn û herweha Emîn Paşa û Qaymeqam Elî Beg û mirovên wan da şerekî dijwar qewimiye, ji herdu aliyan gelek mirov hatine kuştin û birîndar bûne û herwesa heger bi awayekî bilez rê li rikeberiyê neyê girtin, neyartî dê têkeve dirûvekî dijwartir û bi beşdariya serokên eşîrên din va nexweşiyên hîn mezintir dê rû bidin û herwesa telgrafa ji hêla Wilayeta Erziromê verêkirî ya der heqê pêdiviya cezakirina curetkaran da hat şandin û wekî bersiv ji wilayeta navborî ra hat destnîşankirin ku ji bo rêlêgirtin û jinavbirina nexweşiyê û jiholêrakirina sedemên wê digel Muşîriyeta Mezin a Artêşa Humayûn a Çarem hevniwîsîn pêk were û herweha hat balkişandin ku ji hêla eskerî jî çî pêwîst e divê bilez were kirin û bi telgrafnameya xwe ya acîzane va me ji muşîriyeta navborî ra pêşniyaz kir û nivîsand ku wekî di tezkîreya samiyeyê da behskirî ye, çî pêwîst e divê bê kirin û encama wê jî bê nivîsîn û herweha sûreta telgrafnameya kesên navborî yên ji Wilayeta Erziromê, wekî pêvek hatiye erz û teqdîmkirin û di wê babetê da emr û ferman ya hezretî Padişah e.

16ê Cemazeyîlewela 1325an (k.) - 14ê Hezîrana 1323yan (r.) - 27ê Hezîrana 1907an (z.)

Serasker Riza

82

### Wergera bi kurdî ya têlxrafa Serasker Riza-2

Nimroya Arşîvê: Y.MTV.00299.00125.002

Meqamê Seraskerî/Mektûbê Qelemê Xusûsî

Sûretê telgrafnameya bi şîfre ya dîrok 10ê Hezîrana 1323yan e ku ji Wilayeta Erziromê gihîşt Babê Eliyeyê

12ê Cemazeyîlewela 1325an (k.) - 10ê Hezîrana 1323yan (r.) - 23yê Hezîrana 1907an (z.)

Ji ber bicihkirina Resûl Axa a li Xamûrê ya ji hêla Mîrlîwa Huseyîn Paşa yê ji serokên eşîra Heyderî, di nav eşîrê da dijyayê û dijmintî peyda bû û li ser agahiya Huseyîn Paşayê navborî tevî çend sed siyariyên li dora xwe kom kirin ber bi Xamûrê bi rê ket, Wekîlê Fermandarê Lîwaya Hemîdiyeyê bi xwe bû navbeynkar û lihevanîn pêk anî û siyarî ji hev belav kirin. Lêbelê digel vê yekê ji ber ku Huseyîn Paşa cardin maiyeta xwe kom kir û ket nav tevgera dijminane, di navbera van û herweha mirovên Emîn Paşayê Heyderî û birayê wî Qaymeqam Elî Beg ê rûniştvanên qezaya Erdîşê da şerekî dijwar qewimî, ji herdu aliyan gelek mirov hatin kuştin û birîndar bûn û herwesa heger bi awayekî bilez rê li rikeberiyê neyê girtin, bi tûj û tundbûna neyariya ji zû da dewam dike û bi beşdariya serokên eşîrên din va nexweşiyên hîn mezintir dê rû bidin û di vê heyama ziraetê da hetta dê bibe sedema per û perîşanbûna şênîyên feqîr û belengaz ku ev yek di telgrafên Qaymeqamtîyên Qerekilîs û Dutaxê û Wekaleta Muteserrîfiya Bazîdê da hatiye destnîşankirin û



bi qandî vê pileya vî karî, cîbicîkirina tedbîrên eskerî zerûrî ye û rewş ji bo Muşîriyeta Mezin û Femandariya Lîwaya Yekem a navborî hatiye nivîsîn. Ev cure serokên eşîran ên ku bi saya serê Padişah bûne xwediyê şerefa wesfê erkan û femandarê eskeran, bi saîqeya cehalet û zordestiyê va li ser hidûd aramî û rihetiyê têk dibin û teşebusî xwînretinê dikin ku ev yek halekî pir kirêt û sosret e û teşebuskar heta bi lewnekî bi îbret neyên cezakirin, herçiqas bi şûn da rêlêgirtina dubarebûn û qewimînê ne mumkin be jî îcraya îcabî wabesteyî îradeya bilind e. Ferman.

### **KILAMA DELAL**

#### **Versiyona ji dengê dengbêj Maşelayê Mûşî:**

Lo axawo şerekî li me çêbû li Gamêşvanê Tozîbelanê li devê avê  
Eskerê Huseyîn Paşayê Heyderî giran e derketiye ji Patnosê xwe da navê  
Min dî Edoyê Hesên Axa bi sê dangan bang dikir  
Gelî hevalan çê bin çê bixebitin  
Hûn ê lêxin Êskê Bozo Mûsê Zorav bikujin  
Cinazê van xweşmêran bidine li ber tavê  
Were hewarî hewarî hewar hewarî  
Bavo îro li Gamêşvanê agir barî  
Her çar gundê dora Kela Kudo bi serê min da mabû xirûxalî  
Li ser serê eşîra Heydera da bûye gazî hewarî  
Tu bala xwe bidê sala îsal orta Huseyn Paşayê Heyderî, Edoyê Hesên Axa bavo çawa bû neyarî  
Hahê hahî  
Lo axawo îro şerekî çêbû li Gamêşvanê wê bida yalê  
Eskerê Zor Huseyn Paşayê Heyderî derketiye ji Patnosê bavo bi hezar e  
Tu bala xwe bidê gula barûdê îro Edoyê Hesên Axa bi ser bavê Edo da zarezar e  
Heyran wele cabekî hat orta nîvro esrê  
Dibê Eliyê Hesên Axa bi du gula bavo lê birîndar e  
Were ferman e ferman e ferman e mîrê min ferman e  
Heyran îro mi go viya çî dem e çî dewran e  
Eviya çî berf e çî baran e  
Ji êvar da tê dengê qîz û bûkan îro lûbelûbê jinebiyan e  
Hewara me li jorê mabû Rebê Alemê, li jêrê Edoyê Hesên Axayê kela deştê siwarê  
Kurdo bavê Silêman e  
Lo axawo şerekî çêbû li Gamêşvanê bi kereng e  
Eskerê Huseyn Paşayê Heyderî derketiye ji Patnosê bavo rengbireng e  
Mi dî Êskê Bozo bang dikir Mûsê Zorav  
Lêxin Edoyê Hesên Axa bikujin êvar e gelo ro li me dereng e  
Were hewarî hewarî hewar hewarî  
Bavo îro li Gamêşvanê agir barî  
Herçar gundê îro gelo Kela Kudo mabû xirûxalî  
Li ser serê îro eşîra Heyderan da bûye gazî û hewarî  
Tu bala xwe bidê orta Huseyn Paşayê Heyderî, Edoyê Hesên Axa bavo çawa bû neyarî

Lo axawo şerekî çêbû li Gamêşvanê berî bê ye  
Mi di Ûskê Bozo bang dikir Mûsê Zorav  
Lawo îro çê bin çê bixebitin  
Heyran wele ez du gula birîndar im destê min nagire qevda mîrata modolyê ye  
Kesekî xêrxwazî xêra tune cabekî bihere Patnosê li ba Huseyn Paşayê Heyderî lawo mija rû  
erdê ye  
Were ferman e ferman e mîrê min ferman e  
Heyran îro çî berf e çî baran e  
Eva çî mij e çî dûman e  
Ji êvar da tê kalekalê berx û miyan e  
Tê zarîna qîz û bûkan lûbelûbê jinebiyan e  
Hewara me li jorê mabû Rebê Alemê, li jêrê Edoyê Hesên Axayê kela deştê siwarê  
Kurdo bavê Silêman e


**Versiyona ji dengê hunermend Aslîka Qadirê:**

Were hey delal, hey delal tu delal î  
Delal qurban tu delal î  
Were hey delal gazî ye xweş hewar e  
Dora koşka bavê Hemîd girtine çar e çar nikale ye  
Bi gotinê Elî Begê mîrê zirav bi gulê mawîzerê her du zenda birîndar e  
Ne xwezil wê evdî ra ku Hesên Paşa Bavê Edo ra sê roj e bive dijmin û neyar e  
Notlanî Çiyayê Sîpanê û Xelatê mij e û dûman e ser neyar da melû xwar be  
Were hey delal, hey delal, hey delal tu delal î  
Were hey delal, hey delal tu delal î  
Delal qurban tu delal î  
Delal qurban Camûşvanê wê çîman e  
Bi gotinê patrondaşê Elî Begê mîrê zirav ji êvar da kîsî canfîda ne  
Elî Begê erafê meydanê dikir gazî digo Simbo, Sêvo kurê min de rabin çê bin çê bixevtin  
Wextê hewara me yê bê Edoyê Hesên Axa û taxana av û erdan e  
Were hey delal, hey delal, hey delal tu delalî  
Delal qurban şer qewimiye Camûşvanê beriya avê  
Bi gotinê eskerê *kura savde şaşêla têne sitka qûya* gulla davên  
Bi gotinê hatiye kuştinê Îskanê Zero firarê dewletê gula siyara  
De wê çawa cinyazê vî maqûlî danîne Camûşvana kavil nav neyara berî tavê  
Were hey delal, hey delal, hey delal tu delal î

**Versiyona ji dengê dengbêj Hecî Evdilkerîmê Patnosî:**

Delal hay delal hay delal hay delal hay delal hay delal hay delal  
Delal hay delal delal hay delal hay delal î  
Ez ê çî bikim her çar terefê Kela Gulduz axayê min mane xalî  
Îja li ser serê Edoyê Hesên Axa bûye gazî û hewarî


Hele bala xwe binê derdê li ser derda yî  
Orta Zor Huseyîn Paşayê Heyderî, Edoyê Hesên Axa bi resmen bavo bû neyarî  
Bê axawo şereka li me qewimî Gamêşvana şewitî li derî avê  
Lo maqûlo qaleka li me qewimî Gamêşvana kavil li derî avê  
Eskerê Zor Huseyîn Paşa derket ji Patnosê  
Bi sê birûtan ser ciya daye navê  
Edoyê Hesên Axa kire gazî  
Go, Fariz Mihemedê Şana, Evdilê Muslî bavê min bi lawo mêr bin çê bisekinin  
Em ê bikujin Êskê Bozo, Mûsayê Zorav termê van zilaman bidem ber tîra tavê  
Erê bê dewran e dewran e dewran e dewran e dewran e dewran e  
Bira bala xwe binê çî terş e çî talan e  
Cebilxanê Edoyê Hesên Axa ji kîsî canfîdan e  
“Weyle wêlê” qîza li bûka, jinebiyan e  
Gumana me li jor Xwedê ma mîrê mîra ye  
Li jêrê micaciyê Kela Deştê siyarê Kurdo, Edoyê Hesên Axa bavê Silêman e



Y.MTV.00299.00125.001

Arşîva Osmanî: Y.MTV, 299/125/1

Telxrafa der heqê şerê Huseyîn Paşa û herweha Emîn Paşa û Qaymeqam Elî Beg da.



Y.MTV.00299.00125.002

Arşîva Osmanî: Y.MTV, 299/125/2

Telxrafa der heqê şerê Huseyîn Paşa û herweha Emîn Paşa û Qaymeqam Elî Beg da.